



BERNAME & PROGRAM

**PARTÎYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ
PARTÎYA WELATPARÊZANÊ KURDISTANÎ
KÛRDISTAN YURTSEVERLER PARTISI**

PWK

BERNAME / PROGRAM

PARTIYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ

PARTÎYA WEKLATPARÊZANÊ KURDISTANÎ

KÛRDISTAN YURTSEVERELER PARTISI

PWK

PÊŞGOTIN

Partîya Azadîya Kurdistanê (PAK) û Tevgera Demokratîk a Kurdistanê (TDK-TEVGER) di rojên 9 û 10ê Îlona 2023yê de li Amedê digel kesayetên serbixwe kongreya xwe ya yekîtîyê li dar xistin, di roja 10ê îlonê de yekîtîya xwe pêk anîn û Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) hate damezrandin.

PWKyê ji bo wek partîyeke qanûnî jî bikaribe xebatên xwe bimeşîne, dest bi prosedureke qanûnî kir. Li gorî vê prosedura partîyên qanûnî, PAKê di roja 17ê Îlona 2023yê de li Enqereyê, di bin çavdêriya Lijneya Hilbijartinê ya Çankayayê 3yemîn kongreya xwe ya asayî li dar xist. Di vê kongreya qanûnî de, hemû delegeyan bi yekdengî navê PAKê (Partîya Azadîya Kurdistanê), wek PWK (Partîya Welatparêzên Kurdistanê) guhertin. PWK, niha wek partîyeke meşrû û qanûnî xebatên xwe dimeşîne.

Ev bername di Kongreya Yekîtîyê ya di 9-10 îlona 2023an ya li Diyarbekirê û di Kongreya Qanûnî ya di 17ê Îlona 2023yê de li Enqereyê hatiye qebûl kirin.

DESTPÊK

Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK), partîyeke neteweyî û demokratîk e. Ew dixwaze li ser bingehê mafê çarenivîsa milletê kurd û daxwazên mafên neteweyî û demokratîk, li bakurê Kurdistanê beşên civatê yê herî berfireh bi rêxistin bike.

PWK, li hemû xebat û têkoşîna neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê û li hemû destkevtîyên neteweyî û demokratîk xwedî derdikeve; ew xwe berdewamî û kevneşopîya vê xebat û têkoşînê dibîne.

PWK, di vê bawerîyê de ye ku divê siyaset bê demokratîze kirin û kulturek pirrengî û pirdengî bê pêşxistin. Bi vê bîr û bawerîyê, Partîya me wê li gorî van nêrîn û armancên li jêr hatine diyar kirin, xebatên xwe yên siyasî bimeşîne.

Kurd û Kurdistan

Kurd, miletekî bi hezarên salan e ku nişteciyê Rojhilata Nêzîk, Rojhilata Navîn û Mezopotamyayê ye. Zimanê kurdî, bi devokên xwe yên cihê, zimanekî qedîm û dewlemend yê malbata zimanê Hind-Ewropî ye. Milletê kurd, bi ziman, dîrok, kultur, urf û adetên xwe û bi dîrokî xwedî civateke bi îstiqrar e. Ew teva pêkhatyên din yên etnîkî, li ser erdnîgarîya ku bi navê Kurdistanê tê pênasekirin dijî.

Kurdistan ku di seranserî dîrokê de, di navenda herêmeke gelek girîng û stratejîk de cîh girtîye, xwedîyê çavkanî û dewlemendîyeke mezin ya sererd û binerdê ye. Ew, di sala 1639an de bi peymanana Qesrî Şîrîn, di nava Împaratorîya Osmanîyan û Dewleta Safewîyan de wek du parçeyan hate dabeş kirin. Ev duparçetîya wê heta Şerê Yekem yê Cîhanê berdewam kir. Piştî Şerê Yekem yê Cîhanê, bi Peymana Lozanê ya 24ê temûza 1923an Kurdistan careka din hate dabeşkirin. Parçeyê Kurdistanê yê di bin desthilatdarîya Împertorîya Osmanîyan de, di nava Tirkîye, Fransa û Îngilîstanê de hate dabeşkirin. Piştî wê; parçeyê di bin desthilatdarîya Fransayê ji Surîyeyê re, parçeyê di bin desthilatdarîya Îngilîstanê jî ji Iraqê re hate hiştin. Bi vî awayî Kurdistan weke kolonîyeke navdewletî kirin çar parçe. Ev statuya Kurdistanê îro jî weha berdewam dike.

Miletê kurd ji derveyî îradeya xwe hatîye parçekirin, welatê wî hatiye dagirkirin û ew rû bi rûyî neheqîyeke navneteweyî bûye. Lê belê milletê kurd tu carî ev parçebûn, dagirkirin û neheqîya dîrokî qebûl nekirîye.

Teva ku rê û rêbazên wê ji niha de ne diyar be jî, weke millet û welat yekîtîya kurdan û Kurdistanê, mafekî dîrokî, rewşa û xwezayî yê milletê kurd e. Di warê yekîtîya netewe û welêt de û awayê pêkhatina wê de, teva pêkhatêyên Kurdistanê wê milletê kurd bi îradeya xwe ya azad biryarê bide.

Nav, amblem û navnîşana partîyê

Navê partîyê Partîya Welatparêzên Kurdistanê ye. Navê wê yê kurt **PWK** ye. Amblema partîyê li ser zemîna sipî, nîvrojeke bi rengê zer û di binê wê de xeteke sor û xeteke kesk heye ku wek pêlan e.

Herçendî navenda wê ya giştî *bi fermî* Enqere ye, lê çalakîyên xwe fiilî li Dîyarbekirê bi rê ve dibe. Adresa navenda partîyê; Fidanlık Mah. Adalar Sokak, Öztaş Apt. No:18/7B Çankaya / ANKARA ye.

Taybetmendîyên partîya me

Partîya me, xwe bi tu kes, grup, çîn, dîn û mezhebî yan jî herêman tarîf nake. Ew, partîyeke neteweyî, demokratîk û azadîxwaz e; ew dixwaze li bakurê Kurdistanê beşên herî berfireh yên kurd û kurdistanîyên neteweyî û demokratîk himbêz bike.

Partîya me serdestîya hiqûqê û parvekirineke dadwerî esas digire. Ew di têkilîyên xwe yên navxweyî de, di hemû prosesên biryardayinê de û di awayê birêveberîyê de, li gorî birêveberî û rêxistineke demokratîk, şefaf, pirrengî û pirdengî tevdi gere.

Partîya me, rewatîya xwe, ji doza meşrû û mafdar ya milletê kurd û gelê Kurdistanê digire. Ew di xebatên xwe de, prensîpên hiqûq û nirxên gerdûnî ku maf û azadîyên mirovî, nirxên demokratîk,

rêzlêgirtina di nav cudahî, pirrengî û pirrdengîyê de diparêze û esas digre.

Armanca partîya me

Partîya me, li bakurê Kurdistanê û li Tirkîyeyê çareserîya pirsê kurd û Kurdistanê ji xwe re dike armanc û ji bo pêkanîna mafê çarenivîsa miletê kurd (federasyon, konfederasyon, serxwebûn) têdikoşe. Gava şertên pêkanîna federasyon an jî konfederasyonê dudewletî ya ku li ser esasê wekhevîya du miletan were holê; wê partîya me ji çareserîyek weha re vekirî be. Herweha, partîya me li gorî rewş û mercan û bê ku li dijî armanacên wê yê stratejîk be, wê ji çareserîyên demkî re jî vekirî be.

Prensîpên partîya me

- Partîya me, pêkanîna mafên etnîkî, çandî û demokratîk yê pêkhatyên li Kurdistanê dijîn misoger dike û hewl dide ku ew li ser bingehê cudakarîya erênî bi awakî aktîf di nava dezgehên birêveberîyê de cih bigrin.
- Partîya me, serdestîya hiqûqa hevdem û gerdûnî, maf û azadîyên mirovî dixê navenda siyaseta xwe û li dijî hemû awayên cudakarîyên neteweyî, nijadî, zimanî, çînî, dînî, mezhebî, civatî, cinsî, herêmî û hwd têdikoşe.

- Partîya me, bêyî ku bê ew xwe çawa dibîne û çilo pênesedike, li ser esasê nîrxên gerdûnî ji bo herkesî mafê azadîya ramanî, bawerî û rêxistinîyê diparêze.

- Partîya me, li bakurê Kurdistanê û li Tirkîyeyê, dê ji nuha ve û bi lezgînî, ji bo avakirin û pêşdebirina dem û dezgehên milî, civakî, meslekî, zimanî û çandî bixebite. Li bakurê Kurdistanê bi herdu lehçeyên xwe zimanê kurdî (kurmançî, kirdkî/zazakî) di bin xeter û metirsîyeke gelek mezin de ye. Partîya me di wê bawerîyê de ye ku divê tedbîrên acîl ji bo parastin û geşkirina zimanê kurdî bêne girtin û divê di vî warî de demildest hinek projeyên pêwîst bêne amade kirin. Partîya me, piştgirîya hemû dezgeh û kesayetên ku di derbarê parastin, fêrkirin û geşkirina zimanê kurdî de dixebitin dike; li malê, li cihê kar, li bazarê û di peywendîyên digel dezgehên dewletê de axaftina bi kurdî teşwîq dike. Piştgirîya hemû qurs, komele, weqif û dibistanên ku ji bo perwerde û pêşdebirina ziman û kultura kurdî dixebitin, dike. Partîya me, îro wek daxwazeke acîl ji bo zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê û li gel tirkî bibe zimanê fermî û ji bo ku ev maf di Qanûna Bîngêhîn ya Dewleta Tirkîyeyê û di qanûnên peywendîdar de bêne garantîkirin, têdikoşe.

- Partîya me, ji bo gihîştina armancên xwe, li gorî rewş û mercan bêîteatîya sîvîl jî di nav de; ji derveyî awayên tûndûtûjîyê, hemû rê, rêbaz, amûr

û metodên têkoşînê yên vekirî, sîvîl, sîyasî, demokratîk û meşrû bi hemahengî bi kar tîne.

- Partîya me, li bakurê Kurdistanê pêkanîna yekîtî û tifaqên cûr be cûr yên weke yekîtîya sîyasî û rêxistinî, tifaqên stratejîk yên hêzên neteweyî û demokratîk û hevkarî û xebatên hevbeş yên li ser daxwazên acîl, yek ji wazîfeyên xwe yên sereke dibîne. Partîya me vêya weke destpêk û garantîya azadî û rizgarîya neteweyî dibîne.

- Partîya me, li dijî nêrîna *“yek welat, yek millet, yek dewlet, yek ala, yek ziman, yek dîn, yek mezhebî”* ku bi hişmendîya mêtîngehkar ya înkâr, jenosîd, asîmîlasyon û nîjadperestîyê hatîye hûnandin têdikoşe.

Rêveberîya li Kurdistanê

Di pêşerojê de, li bakurê Kurdistanê mafê çarenivîsa milletê kurd bi kîjan awayî pêk were jî, partîya me wê li gorî nêrîn û prensîpên wekhevî, azadî, serdestîya hiqûqî, dadwerî û parvekirineke adilane û li ser esasê îradeya gelên me, ji sîstema demokratîk ya federal ya parlementerîyê jî, ji sîstema demokratîk ya federal ya serokatîyê re jî vekirî be.

Partîya me, garantîya rêveberîyeke adil û demokratîk di sîstemeke ku dezgeha qanûndanîn, birêvebirin û darizandinê ji hev cuda, bêyî ku ew mudaxeleyî nav hevdû bikin û di heman demê de

bi hevkarî û hemahengî bixebitin dibîne. Parlamento di qanûndanînê û di rêveberîya dewletê de dezgeha esasî ya biryardayîne ye.

1. Demokrasî û avakirina dezgehan

- Ji bo jiyana û bireveberîyek adil, demokratîk û azad, wê qanûnek bingehîn ya ku li gorî şert û mercên Kurdistanê û li ser esasê serbixweyîya dezgeha qanûndanîn, birêvebirin û darizandinê bê amadekirin. Bi vê qanûna bingehîn, wê maf û azadiyên hemû etnîsîte, dîn, mezhep, ziman û lehçeyan û herweha mafê statuya wan ya otonom di îdareyên mehelî de bêne garantî kirin.

- Wê sistemeke hîlbijartinê ya li ser prensîpa beşdarîya yekser û di bin çavdêriya hevwehatîyan de hatîye avakirin were meşandin. Sistema hîlbijartinê wê sistemeke şefaf û ewle be ku kes nikaribe midaxale bike. Parlamenter wê bi rêyên demokratîk, bi dengdana dengên veşartî û jimartina eşkere bêne hîlbijartin.

- Tu parlamenter, ji xeynî sûcên îxaneta welêt û sûcên rûreşiyê, wê ji ber gotar û çalakîyên xwe yê sîyasî neyên sûcdar kirin.

- Dezgeha herî bilind ya dewletê parlamento ye ku wê bi rêbazên demokratîk û sistemek hîlbijartinê ya yek dereceyî ku hemû partî û kesên serbixwe bikaribin bi awakî azad û wekhevî beşdar bibin bê

avakirin. Hilbijartina giştî wê li ser esasê dengdana bi dengên dizî û hilbijartina eşkere pêk were.

- Meclîsên herêmî yên ku wê bi hilbijartinê bêne damezrandin, di warê tenduristî, çandî, ewlekarîyê û gelek beşên esasî yên wek wan de, dê, li herêmên xwe xwedî desthilatdarîyêke berfireh bin.

- Hemû astengîyên li ber dîn û mezhebên wek elewîtî, êzidîtî û bawerîyên din wê ji holê bêne rakirin; wê şerd û îmkanên ku her kesên ji ol, mezheb û bawerîyên cuda bikaribin bi awayekî azad û li gorî bawerîya xwe îbadeta xwe bikin, bêne pêkanîn.

- Wê mafên etnîkî, çandî, bawermendîyê û hemû mafên demokratîk yên hemû gelên li Kurdistanê dijîn bêne misogerkin. Wê li ser esasê cudakarîya pozîtîf di rêveberîya dewletê de mafê temsîlîyeta gelan bêne garantîkirin.

- Partîya me, di mijarên pirsgerêkên ku tesîra xwe li ser çarenivîsa hemû welêt ya jî li herêmekê bike, wê rêya referandûmê esas bigre.

2. Sîyaseta me ya aborîyê û mafên civakî

- Hemû çavkanîyên dewlemendîya sererd û binerdên Kurdistanê, hemû daristan, çem û çavkanîyên din, malên hevbeş yên hemû gelê Kurdistanê ne. Ev hemû nîrx û dewlemendîyên

welêt dê di bin desthilatdarîya dewletê de, ji bo berjewendîyên gel bêne bikaranîn.

- Budçeya dewletê wê li gorî nufûsa herêman û bi awayekî dadwerî di nava herêman de bê parvekirin. Her herêm wê bi rêya meclîs û rêveberîya xwe di birêvebirina budçeya xwe de desthilatdar be.
- Partîya me, li gorî berjewendîyên giştî yên millet û welêt, wê aborîyê plan bike;
- Partîya me, li gorî huner û kêrhatîya kesan, wê qadên xebata aborî ava bike;
- Partîya me, Ji bo bêbelansîya dabeşa dahatîyê bê rakirin, ji bo birêvebirina siyasetek ku çavkanîyên aborî bi awayekî dadwerî bê dabeşkirin, ji bo pêkanîna civateke bextewar ku di pêşerojê de metirsîya wê ya aborî tunebe bê avakirin, wê bixebite;
- Partîya me, di pêşketinên aborî de, di hilbirîna dadwerî û dabeşkirinê de, wê hişmendîya ku li ser esasê berjewendîyên tevayê welêt û millet, esas bigre;
- Kurdistan bi nufûsa xwe ya ciwan û zindî, bi dewlemendîya çavkanîyên xwezayî yên sererd û binerdê, ji bo pêşketina aborî xwedî îmkan û potansîyeleke gelek mezin e. Partîya me, ji bo vê hêzê derxîne pêş û vêya di berjewendîyên millet û welêt de bikarbîne, wê bixebite.

- Partîya me, ji bo pêşxistina aborî û bextewariya civakî, wê hewl bide ku bi destên sektorên dewletê û şexsî, senayîyê geş bike. Di vî warî de, wê plan û programên taybetî amade bike û piştgiriyên pêwîst pêşkêş bike.

3. Birêveberîyên meheli

Partîya me girîngîyeke taybetî dide birêveberîyên meheli û hilibjartinên herêmî. Di xebata xwe ya siyasî de pêşengîyê dide vê qad û mijarê. Ew dê li Kurdistanê, li gorî “Şerdên birêveberîyên xweserîyên meheli” ya Ewropayê, di bireveberîya xwecîhî de, birêvebirineke azad û sistemeke nemerkezî cîbicî bike.

4. Perwerde û çand

Partîya me, girîngîyeke mezin dide siyaseta perwerde û hînkariyê ku li ser pêşeroja civatê xwedî rol û bandorek esasî ye. Partîya me di ronahiya nirxên hevdemî de sistemeke perwerde û hînkariyê ya li ser esasê zanistî û azadiya ramanî esas digre ku bikaribe cîlên xwedî hunera muhakemî û bi pîrengîya civatê re lihevhatî bighîne.

Partîya me, ziman, zarava û kulturên ku li Kurdistanê hene, wekhev dinirxîne. Hebûna hemû kêmneteweyan, olan, mezheban û zaravan, maf û azadiyên wan dipejirîne. Ji bo her ziman û bawerî di her qada jiyane de bê astengî bijî dixebite û di

çarçeweya hiqûqa gerdûnî de pêdivîya ewlekarîya wan diparêze.

Partîya me, rewşa taybetî ya her kulturê dide ber çavan, siyaseta perwerdeyê û zimên dispêre birêveberên herêmî. Mafê her kulturê heye ku di binyata xwe ya xwezayî de bijî û bê parastin. Partîya me, asîmîlekirin û înkarkirina her kulturê weke sûc dibîne; azadî, demokrasî û aştîyê bingehê garantîya pêkvejiyana hemû gel û kulturên li ser eynê xakê dijîn dizane.

Li Kurdistanê kurdî wê bi herdu zaravayên xwe (kurmançî û kirdkî/zazakî) bibe zimanê fermî. Li herêmên ku kurmançîaxêf di piranîyê de bin, kurmançî dê lehçeya sereke ya wê herêmê be; kirdkî wê lehçeya axaftinê û di dezgehên dewlet û di sîstema perwerdeyê de fêrbûna bi kirdkî mecbûrî be.

Li herêmên ku kirdkîaxêf di piranîyê de bin, li wê herêmê dê kirdkî lehçeya sereke ya wê herêmê be; kurmançî wê lehçeya axaftinê û di dezgehên dewletê û sîstema perwerdeyê de fêrbûna bi kurmançî mecbûrî be.

5. Siyaseta navneteweyî

Di van şert û mercên ku dinya bûye qada têkoşîna ji nû ve parvekirin û hegemonyayê û li ser vî esasî ber bi pirsêrîtî û sazûmaneke navneteweyî ve diherike de, partîya me wê siyaseteke li ser esasê

berjewendîyên miletê kurd û pêkhateyên Kurdistanê bimeşîne. Di pêwendîyên navneteweyî de, wê siyaseteke piralî ya ku dostên xwe pir bike û dijminê xwe kêmbike, bimeşîne. Partîya me wê di siyaseta xwe ya navneteweyî de xwedîyê siyaseteke çêker be û wê dijminatîya tu miletî neke. Partîya me, li dinyayê û li herêmê wê li cem gelên ku li dijî bêdadwerîyê, newekhevîyê, neheqîyê, kedxwarinê, zilmê û zordarîya neteweyî têdikoşin cih bigre û wê piştgirîya têkoşîna wan ya neteweyî bike.

6. Maf û azadîyên jinê

Di şert û mercên Kurdistanê de, jin teva zilm û zordarîya neteweyî, bi zilm û zordarîya civakî, siyasî, cinsî û aborî jî rû bi rû ye. Partîya me, ji alîyekî li dijî neheqîya neteweyî, civakî û cinsî ya li ser jinê dixebite, ji aliyê din jî jiholêrakirina encamên nîrx û pêwendîyên serdestîya zilêm, weke yek ji wezîfeyên xwe dibîne.

Partîya me, ji bo cîbicîkirina maf û azadîyên jinê yê ji peymanên navneteweyî tî, têdikoşe û ji bo tedbîrên qanûnî, makeqanûnî, civakî û îdarî yê pêwîst bêne girtin dixebite. Di vî warî de ji tecrûbeyên welatên din îstifade dike.

Li ser cudahîya erênî gavavêtinên bingehîn yê ku ji bo jinên Kurdistanê bi awayekî çalaktir, berfirehtir û xwedîbiryar di dezgehên siyasî, demokratîk û sîvîl de cih bigrin, hem ji bo azadîya

jinan û hem jî ji bo azadîya Kurdistanê gelekî girîng û heyatî ye. Heta azadî û rizgarîya jinê pêk neyê, wê bi awayekî rasteqînî rizgarîya civakê jî pêk neyê. Partîya me, ji bo lêkolîn û çareserîya pirsên jinan wê bi kesên pispor re projeyên pêwîst amade bike.

7. Ciwan

Partîya me, ciwanan weke hêza dînamîk û guhêrbar ya îro û pêşerojê dibîne. Ji bo perwerdekirin û gîhandina ciwanên bi sihet, ji xwe bawer, xwedî hişmendîya zanyarî û bawerîyên rexnegir, demokrat û xweşbîn, wê di nav hewildanên pêwîst de be. Partîya me, pêkanîna kar, perwerde û misogerîya jîyaneke bextewarî ya pêşeroja ciwanan, weke wezîfeya xwe dizane.

Ciwan pêşeroja me ne; divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê û partîya me vê dînamîzmê bi awayekî rast têxe tevgerê. Di warê aborî, civakî, kulturî, siyasî û rêxistinî de, ciwanên kurd bi gelek pirs û pirsgirêkan rûbirû ne. Partîya me wê ji bo amadekirina projeyên çareserîya pirs û pirsgirêkên ciwanan bixebite û piştgirîya xebatên di vî warî de bike.

Divê ciwanên kurdan hînbûna zimanê dayikê, dîrok û kultura xwe weke wezîfeyên xwe yên sereke yên neteweyî û mirovî bibînin. Ciwanên kurd yên ku bi teknolojiya hevdem û zanistîyê lihevhatî û têgihiştî xwe pêşve dibin; di hişmendîya welêt û millet de ne; namzetê birevebirinên pêşerojê ne û ji pêşketinên

zanistîyê re amade ne, wê temînata Kurdistanê azad û di Kurdistanê azad de misogerîya jiyaneke azad bin.

8. Zarok, pîr, kal û kêmendaman

Partîya me, ji bo di jiyana civakî de pêkanîna şert û mercên mirovî, maf û azadiya zarok, pîr, kal û kêmendaman, li ser bingehê cudahiya erênî amadekirin û pêkanîna programên taybetî pêwîst dibîne û diparêze. Weke mijarên din, di vî warî de jî partîya me wê ji bo projeyên taybetî bixebite.

9. Tendurustî

Mafê jiyane, mafê herî sereke yê mirovan e.

Partîya me, ligel pêşdexistin û pêkanîna pêwîstiyên hekîmtîya perwerdeker û xizmeta tendurustîya bêpere ye. Partîya me, tendurustîya civakê û mirovan temînata pêşerojê ewle dibîne û girîngîyeke taybetî dide xebatên di vî warî de. Partîya me ji bo tecrûbe û teknolojîyên navneteweyî bîne Kurdistanê, wê bernameyên taybetî amade bike.

10. Jîngeh û pirsgirêka germahîya kûreyî

Partîya me, girîngîyeke taybetî dide pirsê jîngeh, hawirdor û germahîya kûreyî û xwe weke tevgerê jîngehparêz pênase dike. Di vî warî de, weke parçeyê xebatê û têkoşîna navneteweyî, ew dê hewildaneke çalاک bimeşîne. Partîya me, ji bo jîholêrakirina hemû encamên plan û bernameyên

ku xwezaya welatê me wêran dikin, wê program û planên taybetî amade bike.

Mîras û mîrata nirxên dîrokî, parastina jîngeh û xwezayê û geşkirina wê, wezîfe û berpirsiyarîya hevbeş ya hemû mirovahîyê ye. Partîya me, di vî warî de û ji bo parastina xwezaya Kurdistanê û geşkirina wê, çî ji destê wê were, dê bike.

Pêwendîyên bi parçeyên din yên Kurdistanê re

Partîya me ji bo her parçeyekî Kurdistanê, mafê qedera xwe bi destê xwe tayinkirinê diparêze. Teva vê yekê jî her parçe li gorî rewş, şert û mercên xwe yên taybetî, wê awayê birevebirina xwe tayin bike.

Partiya me, pêwendîyên tevgera neteweyî û demokratîk ya her çar parçeyan, weke pêwendîyên biratî yên navbêna rêxistinên welatparêzên yek neteweyî dibîne. Di van pêwendîyan de, prensîpên rêzgirtin, piştgirî, hevkarî û helwestên hevbeş yên dualî esas digire; çareserîya pirs û pirsgirêkên nava tevgera neteweyî ya Kurdistanê di diyalog û bi rêyên aştiyane de dibîne. Li gorî partîya me, divê dijminatîya nava rêxistinên kurdan û bikaranîna şiddetê li hemberî hevdû, bi tevayî bê qedexekirin. Di vî warî de çî bikeve ser milên partîya me, ew dê bi cîh bîne.

Partîya me, destkevtîyên li her parçeyekî Kurdistanê, weke destkevtîyên xwe dibîne, piştgirîya

her pêngav û pêşketineke erênî dike; ji bo parastina van destkevtîyan bi berpirsiyarî tevdigere. Hebûna Dewleta Federe ya Başûrê Kurdistanê û destkevtîyên wê weke destkevtîyên dîrokî, neteweyî û heyatî dibîne. Partîya me, Referandûma 25ê Îlona 2017an ya serxwebûnê di dîroka Kurdistanê de, weke qonaxeke girîng ya dîrokî dibîne; divê dewletên herêmê û hêzên navneteweyî rêzê li biryara gelê me û encamên *Referandûma Serxwebûnê* bigirin.

Partîya me, li Rojavayê Kurdistanê avakirina birêveberîyeke hevbeş ya siyasî, îdarî, aborî, leşkerî û dîplomatîk ya gelê me ku bikaribe statuyek neteweyî, siyasî û cografî bidestbixîne, diparêze û piştgirîya têkoşîna xwişk û birayên xwe ya rojavayê Kurdistanê dike.

Partîya me, li rojhilatê Kurdistanê bi beşdarîya herî berfireh ya hêzên neteweyî û demokratîk avakirina yekîtîyeke kurdistanî diparêze û piştgirîya têkoşîna xwişk û birayên xwe ya rojhilatê Kurdistanê dike.

Kurdên li Tirkîyeyê û têkoşîna demokrasîyê

Di encamên siyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya kolonyalîst, ya tunekirin, înkâr, surgûn û asîmîlasyona bi salan dom dike de, hemû kurdên ku berê li wan deran nişteci bûne, bi milyonan kurd li gelek herêmên Tirkîyeyê cîwar bûne. Divê Dewleta Tirkîyeyê li gorî peymanên navneteweyî tevdigere,

mafên neteweyî û demokratîk yên kurdên li bajarên Tirkîyeyê dijîn nas bike û pêk bîne.

Pêşveçûna demokrasîya li Tirkîyeyê, wê tesîreke erênî li ser çareserîya pirsê kurd û Kurdistanê bi rêyên demokratîk bike. Bi vê bîr û bawerîyê, partîya me piştewaniya hêzên ku li Tirkîyeyê li dijî nijadperestîyê têdikoşin û li gel azadî, demokrasî, edalet û wekhevîyê ne, pêwîst dibîne.

Gelên me yên ku neçar mane koçî dever û bajarên Tirkîyeyê bikin û gelên me yên ku ji berê de li wan deran niştêcî bûne, divê li dijî plan û hewildanên dewletê yên asîmîlasyonê berî her tiştî rêxistinîya xwe pêk bînin û bi hişmendîyeke neteweyî li zimanê xwe yê dayikê, kultur, urf û adetên xwe xwedî derkevin û wan nirxan biparêzin.

Divê li Tirkîyeyê zimanê kurdî li gel zimanê tirkî bibe zimanê resmî. Li bajarên ku kurd lê dijîn, ji dibistana destpêkê heta zanîngehê, mafên perwerdeya bi zimanê kurdî (kurmançî, kirdkî/zazakî) bê nas kirin. Li cihên ku nufûsa kurdan gelek e, sîstemek ku kurd bikaribin di birêveberiyên herêmî de xwe birêve bibin, bê pêkanîn. Ev û maf û azdîyên din yên kurdan, divê di Qanûna Bingehîn û qanûnên din de bêne misoger kirin.

Kurdên dervî welêt û dîyaspora kurdî

Partîya me, girîngîyeke taybetî dide xebat û têkoşîna kurdên li gelek welatên cîhanê cîwar bûne û dixwazin pirsê kurd û Kurdistanê bibe pirsêke navneteweyî. Partîya me, li gorî şerd û mercên van welatan, xebat û têkoşîna kurdên dîyasporê yê ji bo pirsê kurd û Kurdistanê bike pirsêke navneteweyî û ji bo bidestxistina mafên xwe yê demokratîk teşwîq dike û diparêze.

Partîya me, wê piştgirîya xebatên ji bo komele, enstîtu, weqif, dezgehên ziman û kulturî, dezgehên sivîl û civatî, rewşenbîr û akademîsyenan, hemû dem û dezgehên kurdistanî yê dîyasporayê di binê banekî de bicivîne û avakirina navendeke dîyasporayê ku bikaribe lobîyeke xurt bimeşîne, bike.

Daxwazên acil yê partîya me

Siyasetên kolonyalîst yê li ser esasê înkâr, îmhâ, sirgûn û asîmlasyonê yê Dewleta Komara Tirkîyeyê ku heta niha hatîye meşandin, zerareke gelek mezin daye tevî û hebûna neteweyî û demografîya Kurdistanê û texrîbatên mezin pêk anîye. Ev siyaseta dijminatîyê di şert û mercên îro de bêtir bi dijarî berdewam dike. Dewleta Komara Tirkîyeyê li gorî hiqûq û qanûnên xwe yê hene jî tevnagere. Parlementer û birêveberên mehelî berteraf dike, bi tayinkirina qeyûman jî îradeya bi milyon dengdêran binpê dike. Partîya me diyar dike ku divê

Dewleta Komara Tirkîyeyê li gorî hiqûq û peymanên navneteweyî tevbigere. Prensîp û mafên hîlbijartin û xwehîlbijartinê li dinyayê maf û prensîpekî demokrasîyê ye ku nikare tune bê hesibandin; ew mafekî bîngêhîn e ku nayê dev jê berdan û nayê dewir kirin.

Rewşa heye, ne tenê zerarê dide milletê kurd û pêkhatayên Kurdistanê, herweha ev zerarê dide gelê tirk, gelên din yên li Tirkîyeyê dijîn û nîrxên demokrasîyê. Ji bo ev zerar û têkberin kûrtir nebe; Ji bo pêkanîna rewşeke demokratîk li Tirkîyeyê û li ser vê zemînê ji bo bi rêyên demokratîk û aştiyane pirs û pîrsgerêk bêne çareser kirin û mafên bîngêhîn yên milletê kurd û pêkhatayên Kurdistanê bê bidestxistin, partîya me pêkanîna van daxwazên acîl yên li jêr hatine diyar kirin pêwîst dibîne û ji bo wan têdikoşe.

Partîya me, di vê bawerîyê de ye ku avakirina hevkarî û platformên li ser daxwazên acîl, hem ji bo avakirina yekîtiyên demdirêj yên neteweyî û demokratîk, hem jî ji bo rê li ber çareserîya pîrsa kurd û Kurdistanê xweş bike, wê bibe pêngaveke girîng. Partîya me, ji bo partiyên siyasî, rêxistin, derdor, kesayetiyên civakî, dezgehên sivîl û demokratîk bîhê cem hevdu; di nav xwe de û bi mixatabên xwe li derdora talebên acîl, temsîliyeteke hevbeş ya kurdî ava bike, dixebite.

- Di şert û mercên heyî de, amadekirina qanûneke bîngêhîn ya li gorî hiqûqa hevdem bê avakirin ku di serî de mafên neteweyî, kulturî û demokratîk yên milletê kurd, lê herweha milletên cihê, civatên etnîkî û

olî yê li Tirkîyeyê dijîn bêne misoger kirin, yek ji wezîfeyên herî pêşî ye.

- Ji bo pirsra kurd û Kurdistanê bi rêyeke siyasî, demokratîk û wekhevî çareser bibe; divê hebûna milletê kurd bê qebûlkirin, mafên neteweyî û demokratîk yê kurdan bêne naskirin, ev maf di qanûna Bingehîn ya demokratîk ku wê bê amade kirin de bêne garantî kirin.

- Divê zimanê kurdî li gel zimanê tirkî bibe zimanê resmî. Mafê perwerdekirin û hînîkirinê bi zimanê dayikê ji bo zimanê kurdî (kurmancî û kirdkî/zazakî) bê naskirin û ew maf bi Qanûna Bingehîn û qanûnên pêwendîdar bê misogerkirin.

- Divê hemû qedexeyên li ser navê Kurdistanê ji holê bêne rakirin û qanûnên di derbarê derbirîna azadîya fikrê û xwebirêxistinkirinê de bêne rakirin. Divê hemû qedexeyên li ser navê Kurdistanê ji holê bêne rakirin û kurd bikaribin bi navê kurd û Kurdistanê û bi awayekî azad partîyên xwe yê siyasî û dezgehên xwe yê civakî, kulturî û demokratîk damezrînin. Divê ev guherandin û maf bi Qanûna Bingehîn û qanûnên pêwendîdar bêne misogerkirin.

- Divê kesên bi hîlbijartinê hatibin, bi hîlbijartinê herin. Li ser esasê prensîpa parêzbandîya kursîyê, divê hemû parlementerên girtî û mahkûm bêne azadkirin û siyaseta qeyûmê ji holê bê rakirin.

- Divê Dewleta Komara Tirkîyeyê li gorî xala 90ê ya Qanûna Bingehîn ku garantî dike wê li gorî hiqûqa navneteweyî tevbigere, pêk bîne; bê qeyd û şert pabendî peymanên Yekîtîya Neteweyan û Yekîtîya Ewropayê (Kriterên Kopenhagê, Şertên Otonomîyên Herêmî û Bireveberîyê yên Ewropayê û Girêbesta Mafên Zarokan ya Yekîtîya Neteweyan) yên ku îmze kirîye bimîne û demildest têbinî û îtirazên xwe yên li ser van peyman û girêbestan rake.
- Divê hemû nav û navnîşanên bajar, gund, herêm û deveran yên bi kurdî ku bi tirkî ve hatine guherandin ji nu ve bi kurdî werin nivîsîn û hemû astengî û qedexeyên qanûnî û fiîli yên di vî warî de ji holê bêne rakirin.
- Divê hemû kesên ji ber pirsê kurd û Kurdistanê û ji ber bîrûbawerî û çalakîyên siyasî di zîndanên de ne, demildest bêne azad kirin. Dozên di derheqê wan kesên neçar mane de li derveyî welêt weke penaber bijîn bêne rakirin, ew bikaribin paşde vegerin û hemû astengên li pêşîya bi azadî siyasetkirina wan bêne rakirin; di van waran de, qanûn û Qanûna Bingehîn bêne guherandin.
- Divê zilm û zordarîya fiîlî û civakî û astengên qanûnî li jinan dibin bêne rakirin, ev di qanûnan û Qanûna Bingehîn de bêne misogerkirin. Divê demildest Girêbesta Stenbolê têkeve jiyane.
- Di serî de elewî, ehlîheq û êzidî, divê zilm û zordarî û astengkirinên fiîlî û civakî yên li ser

hemû ol, mezheb û bawerîyan ji hole bêne rakirin; azadiya bawermendiyê ji aliyê dewletê ve bê misogerkirin. Divê dawî li helwesta dewletê ya ku mezheba Henêfî weke mezheba dewletê dipejirîne bê anîn; herweha dive dewlet dawî li siyaseta dêmarîtîyê ya li ser mezhebê Şafî bîne û li hemberî hemû mezheban wekhev tevbigere.

- Cîhên mezelên mezinên kurdanyên wek Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Seyîd Riza û Seîdê Kurdî (Nûrsî) û kesayetên din nayên zanîn. Divê ev neheqîya dîrokî bê serastkirin û cîhên mezelên wan bêne eşkerekirin.

- Divê ew texrîbat û wêrankirinên aborî, civakî, kulturî, dîrokî û ekolojîk yên li Kurdistanê pêk hatine, hemû encamên wan ji holê bêne rakirin; îmkan, derfet û rewşek guncav ji bo xelkên hatine koçberkirin ku bikaribin vegerin ser cîh û warên xwe, bê pêkanîn; ji bo zerar û zîyanên wan bêne tazmîn kirin, bi lezgînî programek bê amadekirin û pêkanîn.

- Di serî de di mewzûata perwerdeyê û hiqûqê de, divê dawî li wan têgeh û gotinên nijadperestî, cihêkarî û dêmarîtî yên di edebiyat û lîteratura dewletê de cîh girtine û helwestên di vî warî de, bêne anîn. Helwest, biryar, şêl û tevgerên şexsî û meylên girseyî yên di vî warî de sûc bê dîtin û bêne cezakirin.

- Li Kurdistanê, divê dawî li hûnadina dîwarên sînoran û çêkirina rê û bendavên bi armancên leşkerî bêne anîn.
- Divê sîstema gundparêzîyê (cerdevanîyê) ji hole bê rakirin.
- Divê avakirina bendavên ku xweza û demografîya Kurdistanê xera dike, kevneşopîyên dîrokî di binê ava de dihêlin, zerarê didin tevna ekolojîyê bêne rawestandî.
- Divê dawî li şerê li Kurdistanê tê domandin, operasyonên leşkerî, çalakîyên çekdarî û tundûtûjîyê bêne anîn. Divê pêkanîna van maf û daxwazên gelê me yê acîl û rewşa, bi rawestandîna şerî û çalakîyên çekdarî; herweha bi tu rewş, şert û mercên din ve neyên girêdan.



BERNAME & PROGRAM

**PARTÎYA WELATPARÊZÂNÊ KURDISTANÊ
PARTÎYA WELATPARÊZANÊ KURDISTANÎ
KÛRDISTAN YURTSEVERLER PARTISI**

PWK

BERNAME / PROGRAM

PARTIYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ

PARTÎYA WEKLATPARÊZANÊ KURDISTANÎ

KÛRDISTAN YURTSEVERELER PARTISI

PWK

ÖNSÖZ

Kürdistan Özgürlük Partisi (PAK) ve Kürdistan Demokratik Hareketi (TDK-TEVGER), bağımsız şahsiyetlerle birlikte, 9-10 Eylül 2023 tarihinde Diyarbakır'da Birlik Kongresi'ni gerçekleştirerek, 10 Eylül 2023 tarihinde Kürdistan Yurtseverler Partisi (PWK)'ni kurdular.

Daha sonra, PWK'nin yasal bir parti olarak çalışmalarını yürütebilmesi için bir prosedür başlatıldı. Bu prosedür gereğince, PAK, 17 Eylül 2023 tarihinde Ankara'da Çankaya Seçim Kurulu'nun gözetiminde 3. Olağan Kongresini gerçekleştirdi. Bu yasal kongrede PAK (Kürdistan Özgürlük Partisi)'nin ismi Kürdistan Yurtseverler Partisi (PWK) olarak değiştirildi.

Kürdistan Yurtseverler Partisi (PWK), meşru ve yasal bir parti olarak faaliyetlerini sürdürmektedir.

Bu program, 9-10 Eylül 2023 tarihinde Diyarbakır'da gerçekleştirilen Birlik Kongresi ile 17 Eylül 2023 tarihinde Ankara'da gerçekleştirilen Yasal Kongre'de kabul edilmiştir.

Giriş

Kürdistan Yurtseverler Partisi (PWK), Kürt milletinin kendi geleceğini belirleme ve ulusal demokratik talepleri ekseninde Kuzey Kürdistan'da toplumun en geniş kesimlerini örgütlemeyi hedefleyen milli ve demokratik bir partidir.

Kürdistan Yurtseverler Partisi (PWK), Kürdistan ulusal demokratik mücadelesini ve bu yolda elde edilen milli ve demokratik kazanımları sahiplenir, kendisini bu mücadelenin devamı ve mirasçısı olarak görür.

Kürdistan'da siyasetin demokratikleştirilmesi gerektiğine inanan, çoğulcu bir kültür ve anlayışın geliştirilmesinden yana olan partimiz, siyasi faaliyetlerini aşağıda belirtilen görüş ve hedefler çerçevesinde sürdürmeyi esas alır.

Kürtler ve Kürdistan

Kürtler, binlerce yıldır Yakındoğu, Orta Doğu ve Mezopotamya'da yerleşik olarak yaşayan bir millettir. Kürt dili farklı lehçeleriyle Hint-Avrupa dil gurubuna mensup kadim ve zengin bir dildir. Kürtler, üzerinde yaşadıkları topraklarda dil, tarih, kültür, gelenek ve görenekleriyle tarihsel olarak istikrarlı bir topluluk oluşturan ve Kürdistan olarak tanımladıkları topraklarda diğer etnik gruplarla birlikte yaşayan bir millettir.

